Em Mirin Birakoo...

(Ji Bo Bîranîna Helepçeyê...)

Evdile Koçer

Em ketin ber xezeba felekê...
Mirina bêbav, kirasê xwe li bihara rengîn kiribû....
Strana me li ber deriyê Xeyalistanê nîvco ma...
Qirik li me bû pira Selatê...

Erê birakoo, em mirin...
Xwedêyan jî awir ji me vedabû...
Qêrîna zarokan dibû gilokên mirinê...
Taviya biharê jî negihîşt hawara me...
Gulî û keziyên me ketin ser kûç û kevirên bêbext...

Erê birakoo, em mirin...

Bedena me ji axa bêmirad re bû nameyek...
Gopalên kalan teşiyên pîrikan, bûn kêlê dilê me...
Nefesa me li ber bêhna nêrgizekê sekinî...
Deşt û mêrg bûn goristanên xweziyên me...

Erê birakoo, em mirin...
Teyrên demsalî diketan ser cendekê me...
Xalxalok diperpitîn ber nigê me...
Xecîcok xwar bûbûn ber serê me...
Erê birakoo, em mirin...
Kirasê mirinê bêreng bû...
Axa sar heftreng bû...

Erê birakoo, em mirin...
Nîşe: Ev çend rêzikên jor berî 8 salan hatine nivîsandin!

evdilekocer@yahoo.com

Ligel silavên rengîn...